
**Kêlîya r’astîyê!**

# DÎLÊMA DÎROKÎ,
# AN ÎDÊYA FÎK’S?

## 1. HINEKÎ DI DERBARÊ BÛYERÊN PIŞTDÎROKÎ DA…




Hema destxweda, pey bûyera trajîk a li asîmanê Sûrîyayê r’a, dema hêzên hewayî yên T’irkîyayê li balafir’a r’ûsî ya Sû-24 xistin û anîn xarê (24 mijdara 2015-an), hinek siyasetmedr, r’ojnameger, k’armendên çandê û welatîyên sade, yên R’ûsîyayê di derbarê t’olhildanê da axivîn, gotin, k’a divê çawa ji bo wê gava dijminatîyê ya li dijî R’ûsîyayê T’irkîyayê ceza bikin…

Ewana digotin:

– Ma ne, balafir’ên leşkerî yên R’ûsîyayê, dema di wê herêmê da “mîkrobên” naxweşîya nep’ak a r’adîkalîzma îslamî t’une dikin, ew bi wê t’evahîya şaristanîya cîhanê r’a dibin alîk’ar, ku ew ji webaya sedsala XXI a bi nave DAÎŞ r’izgar bibe!

T’unekirina balafir’a r’ûsî careke dinê da xuyan, ku r’êjîma Erdoxan a T’irkîyayê piştgirîya wan k’omên îslama r’adîkal dike! Û, lewra jî, Pûtîn ew kiryara wek derbekê, ya ku li piştê va li mirov dixin, navkir!

Hêrs û nefreta gel bêsînor bûn… Û li hember vê kiryara k’irêt ev bertek xwezayî bû!

Lê, çawa, êdî?

Lê, her çiqas r’ûdaneke weha ya hestyarî hebû, dîsa jî her kesî dixwast tê bigihîje, k’a tiştekî wisa çawa dikaribû bibûya? K’a r’êvebirîya r’êjîma Tirkîyayê çima li hember R’ûsîyayê helwesteke wisa dijminane dide xuyan?..

Di bernameyên têlêvîzîonan ên weke “top-şow”-an da hinek siyasetmederên r’ûs heyf û poşmanîya xwe dîyar kirin (bila, bi derngîbe jî!), ku di dema xwe da di R’ûsîyayê da çima mafê p’enaha siyasî nedane r’êberê gelê k’urd Abdullah Ocalan, ku ew şansekî mezin bû di destê rêvebirîya siasî yaw ê demê da, ya ku, mixabin, ewê nikaribû faydayê jê bigirin…

Wisa jî di nav gotinên xwe da didan serwextkirin, ku divê R’ûsîya di Bakûrê K’urdistanê da piştgirîya T’evgera r’izgarîxawaz a gelê k’urd bike…

Di nav siyasetmederan da yên wisa jî hebûn, ên ku vekirî bi pirsgirêka ermenîyan tirs li T'irkîyayê difir'andin, ku, eger êdî wisa ye, R'ûsîya divê alîk'arîyê bide ermenîyan, ku ew "…ç'îyayê Araratê û t'evahîya Ermenîstana R'ojava veger'înin…" û h.w.d.

… Ez û dostê min ê dilovan Valêrîy Yêvgênîêvîç va r'ûniştibûn, fîncanên qawê di destê me da, me galegal dikirin û hey li navr'a jî li têlêvîzîonê dinihêr'î…Û wê demê jî hema yek ji wan bernameyan bû. Û di wê da di derbarê wê da dihate axavtin, ku divê T'irkîyayê bi pirsgirêka ermenîyan ceza bikin…

Valêrîy Yêvgênîêvîç di destpêkê da ji xwe r'a bêdeng li bernameyê dinihêr'î, wek ku, qey bibêjî, ew tiştên ku dibihîst û didît wat'edar dikir, û paşê, jinişkêva, bi hers got:

*– Bi r'astî, mirovne balk'êş in, evana! ... Îro t'evahîya cîhanê di derbarê t'evgera bêhemp'a ya gelê k'urd da diaxivin, a ku di R'ojhilata navîn û, di nav da wisa jî, wisa jî di T'irkîyaê da dimeşe. …Û, bi r'astî, di wê herêmê da k'urd bi serê xwe hêzeke t'enê ne, ya ku bi lehengî li dijî DAÎŞ-ê r'adiweste …lê ev camêrên me bi pirsgirêka ermenîyan a sed sal berê tiresê li T'irkîyayê difir'înin!*

*Hîç nakeve heşê min – ji bo çi ye ev?*

*Çi ye, ewana tênagihîjin, an, bi xwe jî haş ji xwe nînin, hema ji xwe r'a fersendek dîtine, ku carekê jî di derbarê wê pirsgirêkê da bi bîr bînin?*

*Belê, ermenîyan di împêratorîya Osmanî da zulm û zor p'ir' dîtine, belê, li hemberî wan bêdadî pêk anîne, weke barbarian zulmeke giran anîne sere wan, lê îro, naha konkrêt pirs di wê da ye, k'a T'irkîyayê çawa ceza bikin, …û bi çi?!*

*Û, ji nişkêva, …!*

*Û, bi giştî, dikarî ji min r'a bibêjî, ew çiqasî r'êale? – Dostê min matmayî, bi awirekî bi hîvî li ç'avên min nihêr'î û axavtina xwe bire sêrî…*

– Çima jî, na!? – Bi awayekî p'ir' ciddî min bersivand. – Helbet, dibû! ...T'enê, eger Yekîtîya Sovêtê hebûya! Û ji k'omarên Kafkasîyayê û Asîya Navîn hêzeke leşkerî ya t'aybet berevkirana. Û di bin navê k'omên leşkerî yên ermenîyan da ew bi balafir'an bavîtana wir, wek ku di dema xweda kirin, dema dak'utane Afxanistanê. – Min got û bi baldarî li r'êaksîona wî dinihêr'î û, dema di awair'ê wî da bêhêvîbûnek hîs kir, min axavtina xwe domand: – Û tê bîra me hemûyan jî, k'a ew serdema Afxanistanê di dîroka me ya sovêtî da çawa destpê bû!..

Û, k'a ew avantyûraya çawa bi dawî bû, ew jî baş tê bîra hemûyan!

Lê…, eger bi ciddî, – min gotina xwe domand, – ezê hewl bidim, di derbarê vê pirsgirêka bi êş û "zêryayî" da bi t'aybetî ji bo te binivîsim!

Li şûna bersîvê, ew bi şêweyekî bêhêvî vebeşirî. Li ber ç'avan bû, ku bawerîya wî pê nîne…

Lê ez, ji bo ku gumana wî "lewaz bikim", min got, helbet, ez soz nadim, ku ezê hema sibê binivîsim, lewra jî pêşnîyar dikim, vê demê du gotarên min ên li ser wê mijarê bixwîne, heya…: ya "Lê k'a, êdî r'astî li k'u ma" [1] û ya "Divê mirov r'astîyê bibîne" [2] (helbet, şêwazên wan ên rûsî!) …

Piştî demekê di malp'er'a nûçeyan ya ermenî ya *Orer.am* da gotarek bi sernivîsa "Pûtîn dê Araratê paşva veger'îne" [3] derk'et, û di wê gotarê da dihate gotin, ku anegorî peymana Moskovayê (s. 1921) ya "dostanîyê û biratîyê" di navbera T'irkîyayê û R'ûsîya Sovêtî da, bajarên ermenîyan ên Qers û Erdahan ji T'irkîyayê r'a mane. Wisa jî ç'îyayê Ararat di nav sînorên T'irkîyayê da maye... Ku piştî ku t'irkan li balafi'ra r'ûsî ya Sû-24 xistin, Pûtîn ferman daye, ku bersîveke bê hêvşandin amade bikin... ku dê peymana Moskovayê betal bikin, û, piştî wê T'irkîyayê neç'ar bibe, erd û aqarne berfireh vegerîne...

Û li cîyekî jî li R'ûsîyayê "ferz kirin", ku ew "divê bi Ermenîstanê r' a bibe alîk'ar, ji bo Qersê, Erahanê û Araratê veger'înin, û k'urd jî dewleta xwe avabikin..." [4]

… Hinekî paşê malp'er'a nûçeyan a «РосИнфо» ("RosÎnfo") gotarek bi sernivîsa "R'ûsîyayê %30-ê erd û aqaran û Araratê ji bo Ermenîstanê ji T'irkîyayê bistîne". [5]

Min ev jî xwend û xwest, ji wan hemûyan r'a bibêjim:

“ ...dixwazim bang li wan bikin, ên ku dem bi dem  wan weşana t’evger dikin, û di wan da r’astîyên dîrokî lêpovajî dikin:

*– Hyfa xwe li gel bînin, boy navê Xwedê be! Ma gelo ewqas jî dibe, ku mirov wî t’enê bi r’astîyên lêporovajî û xiyalan t’êr bike?*

*Ma ne, gel êdî ji talî-tengî û bedbextîyan westyaye...!*”

Na, na, ew hemû, çi ku îro tê weşandin û belavkirin, hêç jî me şaş û matma nake. Me tiştên wisa hê wê demê t’êra xwe bihîstine û xwendine, dema em di Ermenîstanê da diman û diçûne dibistanên ermenî. Û wê demê heya r’adeyekê me ji wan şiroveyên wisa yên dîroka зжцутвэнжт k’urd û ermenîyan “bawer jî dikir”, û heya li cîyekî em ber xwe jî dik’etin, û ewê r’ewşê t’avetî nedida me...

Lê ya balk’êş ew bû, ku nivîsên wisa (û heya ne kên katêgorîk jî!) di dema xwe da heya her’ikîn ser r’ûpelên çapemanîya k’urdî ya bi zimanê r’ûsî ya Moskovayê jî.

...Heya hinek agahîyên “dîrokî” jî hatine “p’eydakirin” û hatin weşandin... na, na, ne ku di çapemenîya ermenîyan da, lê dîsa di weşanên k’urdî da...

Ango – binihêr’, di vê derbarê da heya k’urd bi xwe jî dibêjin!

Û ewana çawa dikaribûn wê pêk bînin, ew jî êdî bi serê xwe pirseke dinê ye!?..

Û ev jî ne hemû ye!

Gihîşte wê r’adeyê, ku di malp’er’a k’urdî ya nûçeyan a “Riataza” da bi zimanê k’urdî nivîsa Têmûrê Xelîl a “Hrant Dînk ji pişta kurdan çû…” hate weşandin û di wê da dihat gotin:  “...Belkî Kurdistan bi destî dostên me yên Amêrîkayê, Ewrupayê, Îsraêlê bê rizgarkirin, em ji dagîrkarên xwe xilaz bibin. ...Îro ji bo serketina vê armancê yekîtîya kurdên bakur û dîyaspora ermenîyan ya dervayî welat lazim e.... *Û dema kurd û ermenî bi hev ra bi ser ketin, wê demê hemû heqên ermenîyan, heta li xwe vegerandina erdê xwe jî, dikarin bêne minaqeşekirinê...*”. [6]

Û piştî demekê, wek r’êplîka vê nivîsê, gotareka min derket. [7]

Di nava hewa van weşanan da gotinên cînarekî min ê Yêrêvanê, “çalakvanekî” t’evgera Qerebaxê yê bi navê Gagîk hate bîra min...

Dawîya salên heyştêyî yên sedsala bihurî bû, wê demê hê Yekîtîya Sovêtê hebû, û em di Yêrvanê da diman…

Di bajêr da hema-hema herr’oj meş û mîtîngên piştgirîya Qerebaxê pêk dihatin.

Bona dema Sovêtê ew dîyardeyeke nû bû, û em hemû bi hizir bûn, me nêr’înên xwe p’ev diguhar’tin, goftûgo dikirin…

Tê bîra min, r’ojekê em, bi cînaran va, di hewşê da berv bibûn û li ser Qerebaxê diaxivîn, li ser r’êyên ç’aeserkirina pirsa wê nêr’înên xwe tanîn zimên…

Û, jinişkêva, Gagîk berbi min zivir’î û got:

*–Diznaî, birê, va, tuyê bibînî, emê Qerebaxê hildin, peyr’a emê Ermenîstana R’ojava r’izgar bikin û, û li wir ji we r’a otonomîyê saz bikin!...* – Wek bersîv, ez t’enê matmayî vebeşirîm! Ez xwe mukur bêm, ji bo daxwezeke wisa, ya ku di r’astîya xwe da li ser dîtinên lêpovajî yê di derbarê dîrokê da avabûne, tiştê ku min bigota, nînbû... Û ji bilî wê, helwesta cênarên dinê jî ne yekawa bû… di sêrî da ewana matmayî tûj-tûj li Gagîk nihêr’în, paşê, bi hizir li min veger’yan, wek mirovekî bibêje – tuyê wî biborînî, boy navê Xwedê be, ku ewî wisa, bêyî ku bide heşê xwe, ew gotinana dan der!

Belê, wê demê (û, hema, îro jî!) di Ermenîstanê da li ser wê mijarê ewqas hatye nivîsîn, ku t’u şansekî nêr’îneke dinê jî, ji bo hebûnê, nikaribû hebe…

Eger kesek bixwaze, li vir wisa jî gotineke kevn bi bîr bîne, ya ku dibêje:

“Hê hirç’ nekuştine, eyarê wî p’arve dikin!” – Ewê mafdar be.

Lê gotina min li vira hîç jî ne di vê derbarê da ye!..

Li vira tiştê bala mirov dik’işîne, her t’enê ew e, gelo ew, ên ku behsa “veger’andina hinek erdan” dikin, haya wana ji r’astîya dîrokî heye? ... Û heya, eger ..., k’a, ew di praktîkê da çawa dikare pêk bê, ewana wê tê digihîjin, gelo?

Ma ne, erd ne kerî k’ade ye – hildin û li hev p’arve bikin! An jî ew heya avayîyê embareke vala jî nîne, ku hinek bidin, û yên dinê jî wergirin!..

Û, ji bilî vê, ma, gelo di dîroka mirovhayîyê da mînakek a wisa hebûye, ku hinek hildin û erdê xwe bidin hineke dinê, ... ji bilî pêşîyên me – medan?! Û di vê derbarê da jî emê hinekî paşê biaxivin.

Lê naha, em nirxandinên xwe bidomînin!

Ango, ew, ên ku pêşnîyarke wisa dikin, ewana di sêrî da dizanin, k'a çi encamê derên…

Ji vira jî pirsa: " Yên ku vê pirsê wisa diwerimînin û didin pêş, di wê da çi berjewendîyên wan hene? Ewana li dû çi armancê ne?"

Ji bo ku bersîva vê û pirsên dinê bê dayîn û diyar bibe, k'a berê wan "pêşnîyaran" berbi k'uva ye, di sêrî da em binihêr'in, k'a ew çi erd û aqar in, k'a bi r'astî xwedîyên wan k'î bûne, û îro jî k'î ne, û her paşê...?!

## 2. …Û R'ASTÎYA DÎROKÎ

Vebijarkên cuda û şiroveyên cuda yên dîrokên gelên cuda hene. Lê carna gel bi xwe dîroka xwe wisa dinivîsin, wek ku ew ji bo wan "guncaw" e, çawa ku ew bi xwe dixwazin wê bibînin.

Û di vê pirsê da ermenî ji gelê dinê cuda nînin.

Lê, dîsa jî, her çi jî hebe, di nav goveka lêger'înên dîroka cîhanê da, di vî warî da gengeşî hert'im jî hene...

Her çiqas gengeşî hebin jî, lê dîsa, di zanista dîrokê ya cîhanê da di derbarê herêmên konkrêt ên cîhanê, di derbarê gel û welaatên konkrêt da dîtin û nêrînên hevbeş û giştî hene, ...û ew jî li ser bingeha wan agahîyaan hatine avakirin, ên ku di ç'avkanîyên kevnar da, di nav wan da wisa jî, di yên ermenîyan da hatine p'arastin. Û ev ç'avkanîyên dîrokî jî, her çiqas, mirovên cuda bixwazin û hewl bidin, wana lêpovajî bikin an veşêrin, dîsa, yek e, her tiştekî nep'endî (bixwîne – veşartî!) r'ojekê dertê r'onahîyê û dibe r'astî!

Lê, dîsa jî, lêger'în di warê şaxên cuda yên dîroka cîhanê da didomin.

Kevirê goşeyî yê dîroknûsîya ermenîyan pirsa sazbûna êtnogênêza pêşîyên ermenîyên îroyîn e di Ûrartûyê da. Û heya ew welatê kevnar wek welatê pêşîyên ermenîyan, lê p'adişahtîya Ûrartûyê jî, wek dewleta ermenîyan didin xuyan...

Û wek ku di Ermenîstanê da, her weha derveyî wê jî ev nêr'în serdest e, hehelbet, dîsa li ser bingeha ç'avkanîyên ermenîyan.

Ew, çi ku di destpêk û nîveka sedsala buhurî da hatye nivîsîn, bi hinek serer'astkirinên biç'ûk va, îro jî desthilatdar e. Lê, dîsa jî di cîhana zanistê da bi giranî nêr'înek heye, û, anegorî wê nêr'înê, ermenî ji Frîgîyayê hatine, Ûrartû dager kirine û di wir da bi cî bûne... û ev jî, dîsa li ser bingeha çavkanîyên kevnar.

Heman dîtin wisa jî di berhemên zanyar-r'ojilatzanê r'ûs ê navdar V. F. Mînorskîy da heye. Û dîtina Mînorskîy jî di derbarê dîroka kevnar a Medyayê û Ûrartû da yek ji yên here destûrmend û bi bandor e. Gelek dîrokzan p'ir'ê caran ji bo dîtinên xwe piştr'ast bikin, berhemên wî wek ç'avkanî destnîşan dikin...

Weha, ew di wê derbarê da, k'a ermenî çawa ji Frîgîyayê hatine Asîya Biç'ûk, çi dinivîse: "...Em dizanin, ku herî kêm, k'urd bi zimanê xwe va ne t'enê arî ne, lê wisa jî ji k'oma gelan a îranî ne. Ji ber wê jî, welatê wan (an ê zimanê wan) – bi bawerîyeke mezin li R'ojhilatê ye... dema medan bi hevpeymanîyên xwe r'a t'evayî Asorisatan ji hev belav kirin (sala 607. a berî Îsa), beşekî mezin ê k'urdan berbi r'ojava va livya. Ji bo hemberhevkirinê divê mirov bi bîr bîne, ku cînarên k'urdan ên here nêzîk ên dewr û zemanan – ermenî, *derdorê heman demê ji Frîgîyayê p'eyda bûn û p'adişahtîya Ûrartû hildan (gelê bi bingehîn ji r'ehên cuda), li derdorên derya Wanê bi cîh bûn. Bi wî awahî, eger r'ehên ermenîyan li bakûr-r'ojava ne, lêbelê r'ehên k'urdan li r'ojhilatê ne...*". [8]

Li vira divê bê zanîn, eger tê gotin, ku ermenîyan wê demê p'adişahtîya Ûrartû hildane, divê ew p'adişahtî hingê hebûya... Lê, heya, eger, mirov bibêje, hema bila ew wê

demê hebe jî, li vira jî pirseke dinê dertê hole: *“Wan ermenîyên p’enaber hêzeke wisa ji k’u anîn, ku bikaribin p’adişahtîya Ûrartû hilweşînin û di erdê wê da bi cîh bibin?”*

Lê, ji ber ku bi r’asteqînî dîyar e, ku dema hatina ermenîyan a wê herêmê p’adişahtîya Ûrartû êdî nemabûye, ew ji hêla art’êşa Medyayê va hatibûye dagerkirin û êdî bibûye p’arç’eyekî wê dewlata gewre û bi hêz ya wê demê. Lewra jî dîsa pirsek dertê holê: *“Ermenî çawa bûne niştecîyên beşekî dewleta Ûrartû ya demekê?”*

Weha, di wê derbarê da lêger’înerê k’urd Ek’rem Cemîl P’aşa çi dinivîse: “...Ermenîyan di sala 600 B.Z. da (*ev hejmar, wek ku tê xuyanê, bi texmîn e.– E. C.*) ji Tirakya hatin Asyaya Biçûk. Di vê navê da, Key Aksar Nînwa vekirand, Sît ji Asîya Biçûk qewirandin, Armenya, Pont û Kapadkiya bi welatê xwe va girê da. Ta windabûna Şahînşahiya Kurdistanê bi destê Îskenderê Mezin, Ermenî 300 sal bûn berbendên Xwehermenda Keyaiyan, ango berbendê Şahinşahiya Kurdan”. [9]

Em li vir têbînîyeke biçûk bînin: *wê demê Ermenîstan bi wî şêwazî hê t’unebûye, û, dibe ku mabesta xudanê p’irtûkê li vir Ûrartû bûye*.

Û ya dinê, ji bo Ekrem Cemîl Paşa Medya bi xwwe dewleta k’urdî bûye. Û ew jî xwezayî ye, lewra ku k’urd bi xwe ne ku t’enê xwe med dihejmêrin, lê xwe wisa tê digihîjin û hîs jî dikin. Û Mînorskîy bi xwe jî bi bawer di wê derbarê da dinivîse, lewra ku, li ber ç’avan e, di wê derbarê da di ber destê wî agahîyên pêbaawer hebûne. Di wê derbarê da wisa jî cînarên k’urdan ên here nêzîk, ermenyan jî dizanibûye. Û ji bo ermenîyan jî ew r’astî bûye.

Û tiştê herî balk’êş jî ew e, ku, her çiqas, Quruşê Gewre (lawê farsê vassal, nevîyê Îştîvêgû/Astîagê p’adişahê Medyayê), bi r’êya derbeya hindur’în bi xayîntî kalkê xwe ji ser t’ext avîtye û desthilat hildaye destê xwe, û, piştî wê farsan li ser bingeha împêratorîya Medyayê dewleta xwe avakirine, û, bi wî awahî, Fars dê-fakto bû mîratxur û dûmahîya dewleta Medyayê, lê ji bo ermenîyan ên fars bi t’u awahî med nînbûne, lêbelê, ji bo wan peyvên *med* û *k’urd* yekwat’ebûne.

Agahîyên dîrokî hene, ku heya sedsala XVI ermenîyan gotine med, k’urd têgihîştine, gotine k’urd, med têgihîştine.

Agahîyên wisa îro jî di ç’avkanîyên kevnar ên ermenîyan da hatine p’arastin. Weha, ew:

“... Berbangê zû *yên med* hatin, ên ku ji wan r’a *k’urd* tê gotin”. [10] – Ev bûyer, a ku di derbarê wê da li vir tê gotin, ango hatina *k’urd-medan* ber dêra ermenîyan a T’spinê, 19-ê gulana 1426-an pêk hatye.

Û:

“... *Ên k’urd*, ên ku binecîyên wî welatî ne, ji wan r’a *med* tê gotin” [11]

Agahîyên weha wisa jî li bal lêger’înerên ermenî yên demên nêzîktirî me jî hene – ên destpêka sedsala XX.

Û, yek jî: wek ku heman Ek’rem Cemîl P’aşa dinivîse, dema p’enaberên ermenî hatine wê herêmê, k’urdan erd dane wan, ji bo ku ew têda bi cîh û war bibin. [12]

Ya bêhtir heşmendî ew e, ku desthilatdarîya Medyayê ji parç’eyê Ûrartûyê yê Başûrê Kafkasîyayê erd dabe ermenîyan, lewra ku ewan erdanaa ji bo wana ne ewqasî baldar bûne, ji ber ku li wan deveran mirov pir’ kêm hebûne, an jî, ji hêla kontrolkirinê va ew bi pirsgirêk bûne. Ma ne, herêmên di bin destê Medyayê da bê ser û bin bûne!?

Wisa jî nêr’îneke dinê heye: med-k’urdan beşek ji axaa Ûrartûyê, ya ku di demeke ne zêde dûr da wana hildabûye, dane ermenîyan, û ermenîyan jî divê li ber wê va hem di art’êşa Medyayê da leşkerî bikirana, hem jî di bajarên wan da k’arên cuda pêk banyana...

Di derbarê bûyerên wê demê da agahîyên balk’êş di dîrokên Medîyayê û Ûrartû da hene. Van agahîyan îro mirov bi hêsane û azad dikare di întêrnêtê da bibîne, û hîç pêwîst jî nake, di pirtûkxaneyan da li wan biger’e.

Va, hinek p’arç’e ji wan:

**Di derbarê Medyayê da:**

"... Zûtirekê (piştî salên 70-yan ên sedasala VII a berî B. Î. – E. C.)... di Medyayê da desthilatdarî dik'eve destê binemaleke binecî, ya dadger Dayûkû. ...Dema nevîyê wî – Ûvaxşatr (bi yewnanî – Kîak'sar) med û babilî bi hev r'a dewleta gewre ya Asorêstanê dir'ûxînin. Piştî wê Mêzopotamîya Bakûrî digihîje Medyayê; pey wê r'a Ûvaxştra Ûrartûyê dager dike û êrîşê dibe ser p'adşahtîyên hûrik ên r'ojhilatê Asîya Biç'ûk; piştî şer'ekî demdirêj ew bi serk'evtinî Anatolîyayê bi Lîdîyayê r'a p'arvedike û çemê Galîsê (Kizin Irmak) jî dibe sînorê di navbera wan da. Bi wî awahî, heya dawîya p'adişahtîya Ûvaxştra Medya digihîja asta here bilind a bihêzbûnê, û dibe xwedîya t'evahîya Îrana îroyîn, Çîyabilindîya ermenîyan (T'orosan. – E. C.), Bakûrê Mêzopotamîyayê û r'ojilatê Asîya Biç'ûk". [13]

**Û – di derbarê Ûrartûyê da:**

"... Di encama têkçûna di şerê Asorêstanê da û serhildanên serokên herêman, Ûrartû beşekî mezin ê xaka xwe winda dike. Di sedasala VII a B.Î. da di Başûrê Kafkasîyayê da Ûrartû hê asûnên (pozîsîon) xwe dip'arêze. R'ûsayê II (685–645 berî B.Î.) li vir kelayan ava dike. P'adişahên Ûrartû ji bo têk'oşîna li hemberî tor'inên (malmezin) serhildêr bi berekê va k'omên sît û k'îmêrîyan ên bi k'irê tînin alîyê xwe. Bi alîk'arîya wan ew wisa jî sala 676-an B.Î. p'adişahtîya Frîgîyayê dirûxînin. Ji ber bihêzbûna P'adişahtîya Medyayê Ûrartû û Asorêstan demekê nêzîkî hev dibin. Lêbelê di destpêka sedsala VI a B.Î. piştî Asorêstanê Ûrartû jî têk diçe û tê dagerkirin û dik'eve nava sînorên Medîyayê". [14]

Û, ya dinê jî: hinek lêk'olîner dibêjin, ku dema Sardûrê III ê kur'ê Rûsayê II (derdorê salên 639—625-an berî B. Î.) Ûrartû êdî bibû wek tor'inîyek a vassal a bi Asorêstanê va girêdayî.

A, hema li vira jî bersîva vê pirsê veşartye: "Gelo çima, jinişkêva, ermenîyan Frîgîya t'erikaandin?"

Em careke dine bala xwe bidinê, k'a di wî p'arç'eyê dîroka Ûrartûyê da, di derbarê Frîgîyayê da çi tê gotin. Va ye, ew:

*"P'adişahên Ûrartû di têk'oşîna li hemberî t'or'inên serhildêr da komên sît û k'îmêrîyan ên bi k'irê tînin alîyê xwe. Bi alîk'arîya wan ew wisa jî sala 676-an a B.Î. p'adişahtîya Frîgîyayê drûxînin".*

Ango, Ûrartû bi alîk'arîya k'omên bi k'irê p'adişahtîya Frîgîyayê dir'ûxîne, û hema ev jî dibe sedem, ku ermenî Frîgîyayê bit'erikînin û bibin p'enaber. Û, heya ew li pey p'eydakirina warekî ji bo jîyanê li ser r'êyan bûne, dewleta Ûrartû êdî ji hêla art'êşa medan va tê r'ûxandin, û hemû xakên wê digihîjin Medyayê. Û her paşê p'adişahê Medyayê beşekî ji xaka Ûrartûyê, yên ku ewî bi xwe dagerkiribûne, dide wan ermenîyn, ên ku ji Frîgîyayê r'evîbûn!..[15]

Ka, em binihêrin, xerîteyê Ûrartûyê û Medyayê di serdemên dîrokê yên cuda da çawa tên xuyan:

1) Dewleta Ûrartû di dema r'êvebirîya R'ûsayê I da (s. 715 – 713 b.Î.);

2) Dewleta Ûrartû di dema r'êvebirîya R'ûsayê II û Sardûrê III da (s. 680 - 610 b.Î.);

3) Împêratorîya Medyayê (s.600 b.Î.).

Û, dema ermenî di wan erdan da bi cî û war dibin, wek ku ew bi nûnerên padişahê Medyayê r'a p'evketibûne, nûnerên wan, ên ku destê wan çek digirt, di art'êşa Medyayê da leşkerîyê dikin, lê yên ku destê wan kar digirt, di bajarên cuda yên Medyayê da k'arên cihêr'eng pêktînin…

Û, wek ku tê xuyan, k'arê ermenîyan ê di wan waran da t'am bi dilê r'êvebirîya Medyayê bûye… Lewra jî, piştî demekê, p'adişahê Medyayê bir'yar dike, Parûyrê t'orinê ermenî, yê ku di k'arên xwe da serk'evtî bûye, t'acîdar bike û bi wê yekê dewleta emenîyan saz bike. Helbet, dibe ku ji bo vê wisa jî motîvên wî yên dinê jî hebûne…

Weha, di derbarê wê da Movsês Xorênat'sîyê bavê Dîroka Ermenîstanê (sedasal V a serdewrana me) çi dinivîse:

*"…Û, weha, dilê min pir şad e û ez şahnaz im, ku em gihîştime wê demê, peyhatîyê pêşîyên me yê bingehîn diguîjin şan û r'ûmeta p'adişahtîyê, … Varbakêsê medî, ... t'or'inê me, Parûyrê leheng digihîne xwe, û soza r'êz û nîşanên p'adişahtîyê dide wî".*

Û êdî di cîyekî dinê da Xorênatsî ne r'astedêr piştrast dike, ku padişahê Medyayê soza xwe pêk anye, û t'or'inê ermenî t'acîdar kirye. Û hema li wira jî ew lîsteya serdarên ermenîyan, li r'ax wan jî navên p'adişahên Medyayê, yên hemdemîyên wan tîne. Weha, Xorênat'sî p'adişahê ermenî yê yekem çawa dide nasîn: "... em lîsteya p'adişahên me û li r'ex wan wisa jî navên p'adişahên Medyayê binivîsin. *...lê padişahê me yê yekem, yê ku ji hêla Varbakêsê medyayî va hatibû t'*acîdarkirin, Parûyrê lawê Skayordî bû*". [16]

Li vira divê bê gotin, ku dema Parûyr t'acîdar kirine, desthilatdarîya Medyayê ne ku Varbakês, lê Kîak'sarê p'adişahê p'adişahan pêk anye. Û, ji bilî wê, p'adişahekî Medyayê yê bi navê Varbakês nînbûye.

Di dema xwe da min digot, dibe ku, Xorênat'sî ew nava ji hinek ç'avkanîyan hildaye, yên ku haya me ji wana nîne. Lê paşê min li bal Hêrodotos agahîyeke balk'êş dît, ya ku berê min zêde wat'e nedabûyê. Ji dîrokê tê zanîn, ku di Medyayê da piştî Kîak'sar Astîagê lawê wî (Îştûvêgû) tê ser t'ext. Û bi boneyeke dinê, di wî cîyî da, li k'u Hêrodotos behsa Îştûvêgû (Astîag) dike, ew yekî bi navê Harpagos jî bi bîr tîne, yê ku mirovê binemala p'adişê bûye. Û ew wî di nav medan da wek mirovê herî pêbawer û r'êvebirê P'adişahrîya Medyayê dide nasîn. [17] Û, wek ku ji pêwendîyên Îştûvêgû ên bi Harpagos r'a tê xuyan, ewî ne t'enê bawerîya xwe bi r'êvebirê p'adişahtîya xwe anye, lê wisa jî gur'a wî kirye û qîmet daye nêr'înên wî. Wek ku tê xuyan, ew jî ji ber wê bûye, ku Harpagos bi t'emenê xwe va ji Îştûvêgû nezintir bûye û xwedî cêr'ibandin û gotin bûye, lewra jî hê di dema p'adişahtîya Kîak'sarê bavê Îştûvêgû da xwedî erk'a r'êvebirîyê bûye. Lewra jî, dibe ku t'acîdarkirina Parûyrê t'orinê ermenî ne ku Kîak'sar bi xwe pêk anîbe, lê ewî ji bo wê Harpagosê r'êvebirê xwe ji bo wê bi fermî erk'dar kiribe û şandibe... Lê ew, ku navê Harpagos li bal Xorênat'sî bûye Varbakês, an ew ji ber wê bûye, ku ermenîyan ew nav wek Varbakês bilêv kirine (*Harpagos – Varpagos*; ma ne, navê Astîag//Îştûvêgû di ermenî da wek Ajdahak//Aşdahak tê zimên, lê navê Vîştasp – wek Vîşap), an jî, dibe ku, ev şaşîya wan bûye, yên ku ew ji ber nivîsîne, ango şaşîya jibernûseran bûye?...

Di derbarê wat'eya ç'arenûsî ya t'acîdarkirina Parûyr ji hêla medan va, û bi wê damezirandina dewleta ermenîyan, di dîroknûsîya ermneîyan da hewl didin, bêdeng bimînin, behsa wê nakin, qey bibêjî, hîç jî tiştekî wisa nebûye.

Lê, dîsa jî, ev bûyera dîrokî bi şêwazekî t'aybet di p'irtûkeka ezdazan (t'êolog) û zanyarê ermenî, erk'darê olî yê dawîya sedsala XIX – destpka XX, ark'îmandrît S.V. Têr-Manvêlyan dîyar dibe. Weha, ew di destpêka p'irtûka xwe ya "Kurmanjên yêzîdî" da çi dinivîse: "Ji bo vê lêger'îna dîrokî wek sergotin (epigraph) min ev r'êzên hanê ji p'irtûka Movsês Xorênat'sî ya "Dîroka Ermenîstanê" hilbijartine: *"Û, weha, ez dilşad û şanaz im!... "* – hindik e, lê bêhemp'a ye, – S. V. Têr-Manvêlyan dinivîse, –ji van gotinan wek tîrinca r'onahîyê, dilşadîya bilindtirîn û şanazîya Xorênatsî dîyar dibe, ji bo mirovê xwe yê nêzîk û delalî, Parûyrê ji binemala Hayk (anegorî efsaneyê – pêşîyê ermenîyan. – E. C.), ê ku ji hêla Varbakêsê medî yê ji binemala Vîştaspê Medyayî va wek p'adişahê yekem hatye t'acîdarkirin... *Û, weha,* ***bi pêkanîna t'acîdarkirina Parûyr,*** - S. V. Têr-Manvêlyan didomîne, – ***Ermenîstan ne t'enê ji maldarîya bindest (vasal) werguhêr'î desthilatdarîya p'adişahtîya xweser dibe, lê, her weha, p'êwendîyên wê yên siyasî-çandî bi dewletên cînar r'a çê dibin, wek yên di navbera me – ermenîyan û medên ji binemala Vîştasp da, yên ku yek ji dewletên hêztirîn ên wê demê bûye. Û şaxê wanî herî nêzîk jî kurmancên êzdî yên îroyîn in.***

*...Û piştî vê, di navbera herdu net'ewên me yên cînar û hevpeyman da demeke dirêj hem p'êwendîyên siyasî-hevpeymanî, hem jî yên dostanî yên here nêzîk têne domandin..."* [18]

Ango, ya ku îro tê nivîsîn û gotin, ew, eger mirov şêweyekî nerm bibêje, ne anegorî r'astîya dîrokî ye. Ew hemû dijî wê ye, ya ku di ç'avkanîyên dîrokî da tê gotin, û berê pêşin, di ç'avkanîyên ermenîyan da. Û r'astî jî ew e, ku *med-k'urdan erd dane ermenîyan, ji bo wan dewlet sazkirine, p'adişahê wan ê yekem t'acîdar kirine!..*

Û ev jî hê ne hemû ye!

K'urdan alîk'arî dane p'enaberên ermenî, ji bo ku ew bi cî û war bibin, ji wan r'a k'ar p'eyda kirine, ji bo ku ew bikaribin qazenc bikin û malbetên xwe xwedî bikin…

Û ji bo wê ewana ji bo ermenîyan di bajarên xwe da k'arên cihêr'end p'eydakirine.

…Û, wek ku Têr-Manvêlyan dinivîse, ji ber ku *"...di navbera…herdu net'ewên hevpeyman ên cînar da p'êwendîyên siyasî-hevpeymanî û yên dostanîyê û cînartîyê hebûne…"*, bi xwezayî bûye, ku ermenî dem bi dem bêne Medyayê, ji bo qazencê k'ar bikin û bi p'îşesazîyê û bazirganîyê va mijûl bibin. Û bi wî wayî, bi berekê va ermenî hatine bajarên k'urdan ên ek: Wanê, Amedê û yên dinê... Û her paşê ewana ji wira belavî navçe û bajarên dinê yên herêma R'ojhilata Navîn dibin û hê ji wê wêda jî diçin...

Lê naha jî k'urd bi xwe, bi r'ayê ç'arenûsê, bûne "sûcdarên" bêguneh û yên "binat'ara rê", û hinek jî r'abûne û bazarîya xaka wan dikin!?

Han, ji we r'a exlaq û "dadwerîya" dîrokî!

Lê, k'a, em her'in pêş!

… Wisa jî tê zanîn, ku ji destpêka sedsala XVIII û nîveka ya XIX va ermenî ji bo p'eydakirina karên nû û bazarên nû ji bo bazirganîyê, bi berekê va derbazî bajarên mezin ên Kafkasîya R'ûsîyayê dibin û êdî di destpêka sedsala XX da ewana di bajarên sereke yên wê herêmê: T'iflîs û Bak'ûyê da bi hejmara xwe va di nava niştecîyan da dibina p'ir'anî. Û, eger ew bûyerên dramatîk ên salên bîstî yên sedsala XX nînbûna, ew bajarana dê bi sazîya niştecîyên xwe va bibûna yên ermenîyan...

Di dîroka mirovhayîyê da, helbet, pêvajoyên vî r'engî, dema gelên cuda ji hinek herêm û bajaran derbazî hineke dinê dibin, pêk hatine...

Wisa jî gelekî di derbarê împêratorîya Tîgranê Mezin da tê gotin. Di nava dîroknûsîya ermenîyan da evê wek dewleta ermenîyan– Ermenîstana Gewro, nav dikin...

Lê di vê dîrokê da jî gelek tiştên ne zelal hene.

Di sêrî da divê bê gotin, ku wê demê, di sedsala I a sedema me da, dewletên net'ewî, bi têgihîştina wan a îroyîn, nikaribûne hebin. Çi nav jî li wan kiribin, an bikin, yek e, ewana hebûn û milk'ê mirovên konkrêt, binemalên konkrêt bûne… Û, lewra jî, piştî mirina Tîgranê Mezin ê sazûmank'arê wê împêratorîyayê, ew nemaye, û, bi xwezzayî, Tîgranakêrt jî, wek p'ayt'ext nemaye, û, piştî demekê binva berbi t'unebûnê va çû…

Pirs dertê holê – çima?

Ma ne li ser xaka K'urdistanê heya bajarên ji Tîgranakêrtê kevntir jî hene, û, her çiqas ji destê dagerkerên biyanî zyanên mezin jî dîtine, lê xwe li ser p'êyan r'agirtine û hatine, gihîştine r'ojên me?.. Dibe ku Tîgranakêrt û, her weha, împêratorîya Tîgranê Mezin, bi giştî, nehatine p'arastin, lewra ku ew bi xwe "projeya" binaemala p'adişahên dewletên wê herêmê yên bi hêz û hevpeymanîyên wan bûye? Lewra ku ew sazîyeke bi sûnî çêkirî bûye, ji ji herêmên cuda yên cîhanê mirovên cuda bi zorê anîne wira? Û lewra jî dema danêr-sazûmank'arê "projeyê" namîne, wê demê "proje" bi xwe jî namîne!

Û ew dewlet, dewleteke p'ir'net'ewî bûye, lê Tîgranakêrta p'aytexta wê jî, bajarekî şêwazê hêllênî (yewnanî) bûye, û di wî da çanda hêllênî serdest bûye... Heya di têatroya bajêr da jî, ya ku ermenî têatroya xwe ya yekem nav dikin, berhemên nivîskarên yewnanî lîstine. Û ne t'enê p'ayt'ext, lê, her weha, împêratorî bi xwe jî hêllênî bûye, û di derbarê wê da jî ermenî bi xwe dinivîsin: *"... Mirov dikare bibêje, ku Tîgranê Mezin di Asîya Başûr-R'ojava da damezranêrê dewleta hêllênî ya dawîyê bûye"*. [19]

Û ji bilî vê, eger ew erd û aqar Ermenîstan bûna, çima Tîgran p'ayt'exta xwe ne ku di Ermenîstanê da ava kirye, lê di K'urdistanê da – ewqasî dûrî Ermenîstanê? Û, ya dinê, eger

Tîgran p’adişahê ermenîyan bûye, çima ew ne ku di Artaşata p’ayt’exta Ermenîstanê da tacîdar kirine, lê, wek ku ç’avkanîyên ermenîya dinivîsin, “...di pîrozgeheke navdar a Axdznîkê da (Herêma Xerzan. – E. C.), li ku paşê Tîgranakêrta p’ayt’ext tê avakirin”. [20]

Û, paşê, ji bilî van hemûyan, pirsa net’ewa Tîgran îro jî gelek pirsa derdixe pêş… Gelek k’urdbûna wî destnîşan dikin.

Û, hem jî, eger ew dewleta ya ermenîyan bûye û Tîgranakêrt jî p’ayt’exta wê bûye, divê li wir ermenî hebûna?.. Wê demê mirov çawa vê têbigihîje, ku her piştî bidawîbûna avakirina Tîganakêrtê, Tîgran nûnerên malmezinên ermenîyan cîguhêzî wir dike? Û di derbarê wê da jî bi xwe ç’avkanîyên ermenîya dinivîsin.

Û, her çiqas ev danayan hene, yek e, di ç’avkanîyên ermenîyan da tê gotin, ku p’ir’anîya niştecîyên Tîgranakêrtê Ermenî bûne (?!). Ku li wira wisa jî gelek cihûd, yewnan, asorî, kappadokî û yên dinê mane... [21] Lê di derbarê k’urdan da peyvekê jî nabêjin. Pirs dertê hole – çima?

Mirov çawa têbigihîje? *Med-k’urdan ermenî hêwirandine, dema ew p’enaber bûne, li dû p’eydakirina cîhekî li ser r’ê û dirbên welatên cuda bûne, erd dane wan, ji wana r’a dewlet sazkirine, p’adişahê wan ê yekem t’acîdar kirine,* lê pey r’a, dema li ser xaka K’urdistanê dewletek tê sazkirin, li wir jî p’ayt’exta wê dewletê tê avakirin, lê dîroknûsên ermenî dinivîsin, ku li wira, k’î bibêjî, hebûne, ... ji bilî k’urdan. Ma, tiştekî wisa dikare bibe? Ma, gelo ev ne lêpovajîkirina dîrokê ye (*falsification*)?

Erê, em bibêjin, ew ne dewleteke k’urdî bûye, lêbelê, ma ne, beşekî mezin ê K’urdistanê di nav wê împêratorîyê da bûye, û p’ayt’exta wê bi xwe jî li wir bûye?!

Û, dibe ku, lewra jî, her çiqas di Ermenîstana Sovêtî da di nav sazîya Înstîtûta R’ojhilatanîyê ya Akadêmîya Zanistê da beşê k’urdzanîyê hebû ye, yê ku paşê bûye şaxekî wê, di nav sazîya Fakûltêta R’ojhilatzanîyê ya Zanîngeha Yêrêvanê da jî beşê  k’urdzanîyê hebûye, di R’adîoya Yêrêvanê da beşê weşanên k’urdî hebûye, Şaxê nivîsk’arên kurd hebûye, di Yêrêvanê da bi zimanê k’urdî r’ojnameya “R’ya t’eze”,  p’irtûkên p’erwerdeyî û wêjeyî hatine weşandin, lê, yek e, hîç kesekî jî di derbarê wî p’arç’eyê “Dîroka Ermenîstanê” ya Xorênat’sî da heya bi bîr jî naeanîne – ew jî ew p’arç’e, *yê k’u di wî da tê gotin, çawa medan Parûyrê t’or’inê ermenîyan t’acîdar kirine û bi wê yekê dewleta ermaenîyan saz kirine*. Ji xwe hîç kesekî heya navê p’irtûka nirxdar a “Yêzîdên kurmaj” û xudanê wê – ezdazan (t’êolog) û zanyarê hêja – S. V. Têr-Manvêlyan hîç nebihîstibûne jî!..

Û, eger ewî lawê gelê ermenî yê hêja bizanibûya, ku hemnet’ewîyên wî dê pey nivîsîna vê p’irtûka wî r’a, piştî dehsalan, di nav sînorên k’omara xwe ya net’ewî da wisa bînin serê dîroka gelê xwe (û ne t’enê ya gelê xwe!), dibe ku dilê wî dê p’ir’ bêşya û ewê p’ir’ ber xwe bik’eta...

**PAŞGOTIN**

...Naha jî di wê derbarê da, k’a dê çi bibe, eger her yek r’abe û daxwaza erdê “xwe” bike!

Helbet, evê pirsê ne îro, û ne jî duh r’û daye. Ev wê demê derk’etye holê, çaxê di dema xwe da yekî xwestye, ku daxweza xwe li şûna r’astîyê bide xuyan û ji bo wê r’astîyên dîrokî lêpovajî kirine...

Û ev jî bûye ç’avkanîya van hemû “daxwezîyana”!

Û, eger ermenî daxwez dikin, ... çima daxweza wan erd û aqarên net’ewên dinê nakin, ên ku di nav împêratorîya Tîgranê Mezin da bûne, ya ku ew Ermenîstana Mezin dihejmêrin? Çima, em bibêjin, wisa jî doza xaka Firîgîya dîrokî nakin, a ku ew bi xwe jê hatine, an jî hewl nadin, Ermenîstana Kîlîkîyayê veger’înin?..

Eger wisa be,…li ser erd û aqarên berfireh ji Navçemkê (Mêzoponayayê), heye Kafkasîya Başûrî jî di nav da, di serdemên cuda da dewletên k’urdan ên mezin û biçûk hebûne, êdî em di derbarê mîrtîyên nîvserbixwe da nabêjin.

Ê, çi ye, k’urd jî divê daxweza wan erd û aqaran bikin?

Em mînakên ji paşer'oja dûr ji bo zanyar-dîrokzanan bihêlin û li vira her t'enê dewleta k'urdî ya şeddadîyan bi bîr bînin, a ku di nîvake sedsala X da li ser erd û aqarên Kafkasîya Başûr û beşekî Bakûrê Kurdistanê hatye sazkirin, û Dvîn jî p'ayt'exta wê bûye (951—1173). Û herêma berfireh ya Erranê ya r'ojilatê Kafkasîyayê – bi Genceya navenda xwe va, t'evahîya Qerebaxê (ya ç'yayî û ya panavê), hemû aqarên K'urdistana Sor a Sovêtî ya demekê, wisa jî aqarên berfireh ên komarên îro yên Adrbêcan, Gurcistan û Ermenîstanê di nava sînorên wê dewletê da bûne...

Îjar, eger mirov wisa li pirsê binhêr'e, k'urd divê îro daxweza wan hemû erd û aqaran bikin?! Helbet, pirsa navçeyên otonomîya K'urdistana Sor a Sovêta berê (Laçînê, Kelbecarê, Qubatlûyê, Zengîlanê û Cebraîlê) ji yên dinê cuda ye. Ew lap pirseke t'eze ye! Û hîç kesek jî dê nikaribe mafên k'urdên wan navçeyan r'ed bike, yên ku ji ber bûyerên Qerebaxê p'enaber bûne û îro bê merc û derfet di navçeyên cuda yên Adirbêcanê û k'omarên dinê yên Sovêta berê da dijîn.

Û, eger dest bi pêvajoya ç'areserkirina pirsên Qerebaxê bikin, dê bêdadî be, eger pirsgirêkên K'urdistana Sor û welatîyên wê bên jibîrkirin!..

Û, hem jî,...!

Eger mirov bi vî awayî lê binihêr'e, wê demê, em bibêjin, Îtalîya dikaare daxweza hemû aqarên dora Derya Sipî bike û, û pêr'a jî, Asîya Biç'ûk (Anatolyayê), bi Tirk'îyayê û beşekî mezin ê Felestînê va hilde.

Lê, eger êdî mirov veger'e Împêratorîya Îskenderê Mezin, wê demê t'evahîya R'ojhilata Navîn heya Hindistanê ya wî bûye.

Û, eger êdî wisa be, îro sedemên R'ûsîyayê bêhtir hene, ku ew daxweza erd û aqarên Qazaxistanê, Ûzbêkistanê, Qirqizistanê, T'ûrkmênistanê, T'acîkistanê, Ûkraînayê, Polonîyayê, Fînlandayê, Bêlor'ûsîyayê, k'omarê R'exbaltîkayê, Gurcistanê, û Ermenîstanê bike, lewra ku ew hemû erd û aqar ne demeke zêde dûr di nava sînorên Împêratorîya R'ûsîyayê da bûne. Lê di derbarê wê da heya nayê heşê heşê r'ûsan jî, lewra ku ew dizanin, ku ew bi dîrokî ne r'ast e û ne anegorî berjewendîyên wan ên net'ewî ye jî. Û, lewra jî ew serê hemwelatîyên xwe bi xiyalan t'uje nakin û berê wan nadin cîhekî dinê...

Mirov dikaribû, mînakên weha dîsa banyana, lê ev jî bes in.

Xêredmendê (aqilmend) sedsalên navîn dê bigota:

"Daxwazên mêtîngerî li bejna net'ewên mêtînger tê!"

Dibe ku xwendevan bipirse: "Ê, paşê...?"

Paşê? Divê mirov bi r'oja îroyîn bijî û di derbarê pêşer'ojê da mitale bike!

Û ji bo vê jî formûla ç'areserîya hemû pirsan heye. Ew formûla jî di dema xwe da, hê di destpêka salên nodî yên sedsala bihurî, r'êberê net'ewî yê gelê k'urd Abdullah Ocalan pêşniyar kirye.

Ewî gotye, ku K'urdistan t'enê welatê k'urdan nîne, ku ew wisa jî welatê nûnerên wan gelan e, yên ku bi dîrokî li ser erdê wê jîyane... Ewî wisa jî gotye, ku îro ji bo wê xakê têk'oşîna r'izgarîyê dimeşe, û yên ku ewê welatê xwe dihejmêrin, bila bên, bi hev r'a welatê xwe r'izgar bikin, û bi hev r'a bijîn, wek xwedîyên vî erdî, bi hemû mafên xwe yên net'ewî va!

Divê bê gotin, k'urdan mînaka di jîyanê da pêkanîna wê îdêyayê êdî nîşan dane. Êdî di R'ojava da nûnerên hemû gelan (ereb, asorî, ermenî, t'urkmen!), t'ev jî weke k'urdan, wek endamên wekhev ên mala hemûyan, bi hev r'a têk'oşîna xwe dimeşînin û welatê xwe ava dikin...

Lê, êdî wekî dinê çawa dibe?

Di dema xwe da Şêx Ubêydullayê serokê serhidana k'urdan a dijî osmanîyan a sala 1880-î ji boneya p'êwendîyên k'urd û ermenîyan gotye: "Ji bo p'êwendîyên dostane yên k'urd û ermenîyan gefa destê dijmin heye. Wî destî bibir'in, û herdu gel dê heta hetayê dost û xêrxwaz bimînin!"

Mirov li vira çi dikaribû bigota?

Xweş hatye gotin, lê, divê mirov hê bizanibe, k'a "r'ehên" wî destî li k'u ne?

Lê bi giştî, bi dîtina min, berî ku destê dijmin biger'in (ji xwe dîyar e, k'a ew ê k'ê ye!), divê ç'avkanîyên kevnar ên ermenîyan, ên ku xelkên cînar jê sûdê werdigirin, r'ast bixwînin, bidin xwendin û şirove bikin…

Û ya dinê!

Minê di dawîyê da dîsa ew gotinana dubare bikira (bila ew cara hezarî be jî!), ên ku li jorê min êdî gotine:

" ...dixwazim bang li wan bikin, ên ku dem bi dem wan weşana t'evger dikin, û di wan da r'astîyên dîrokî lêpovajî dikin:

*– Hyfa xwe li gel bînin, boy navê Xwedê be! Ma gelo ewqas jî dibe, ku mirov wî t'enê bi r'astîyên lêporovajî û xiyalan t'êr bike?*

*Ma ne, gel êdî ji talî-tengî û bedbextîyan westyaye...!*"

---

[1] http://www.amidakurd.net/qunciknivis/lê_k_a_êdî_r_astî_li_k_u_ma ;

[2] http://www.amidakurd.net/qunciknivis/divê_mirov_r_astîyê_bibîne ;

[3] http://i-pr.am/?p=988 ;

[4] http://azart-ude.livejournal.com/1135917.html ;

[5] http://my-disain.ru/rossiya-zaberet-u-turcii-30-territorijj-i-ararat-dlya-armenii/?_utl_t=fb, wisa jî: http://maxpark.com/community/5652/content/4957866 ; http://mosmonitor.ru/blogs/polytic/ rossiya_zaberet_u_turtsii_30_territoriy_i_ararat_dlya_armenii;

[6] http://riataza.com/kurdish/4960-hrant-dink-ji-pita-kurdan-cu.html ;

[7] http://www.amidakurd.net/qunciknivis/gelo_kesê_bikaribin_evê_tê_bigihîjin ; R'ojnameya "Pênûsa nû", hejmarên: 47 û 48 – http://www.penusanu.com ;

[8] Минорский В. Ф., Курды. Заметки и впечатления, Петроград, 1915 г., стр. 6 – 7// *Mînorskîy V. F.,* "Yên k'urd. Têbînî û bîranîn", Pêtrograd, 1915, r'û: 6 – 7.

[9] Ekrem Cemîl Paşa, Dîroka Kurdistan bi kurtebirî, Bruksel, 1995, r'û: 231 – 234

[10] □□□□□□□□□□ □□□□□□□, □□□□□□□, □□□□□□□, 1882, □□175 – 180//Arîstakês Têvkants, "Hayêrg", T'îflîs, 1882, r'û: 175 – 180;

[11] □□□□□□□□□□ □□□□□□□□□□□□, XVI □□□□ □□□□□□□□, № 1495, □□.□□. 142□ □ 142□// Matênadarana Ermenîstanê, Înstîtûta destnivîsên kevnar, desrnivîsa dewra XVI, №1495, r'û. 142a û 142b;

[12] Li jêdera 9. binhêr'e!

[13] https://ru.wikipedia.org/wiki/Мидия, так же: Дьяконов И. М., История Мидии, Москва – Ленинград, 1956г., стр. 293 – 323.//Dyakonov Î. M., "Dîroka Medyayê", Moskva – Lênîngrad, 1956, r'û. 293 – 323.

[14] http://www.booksite.ru/fulltext/1/001/008/114/412.htm, wisa jî, Pyatrovskîy B. B., "P'adişahtîya Wanê (Ûrartû)", Moskova, 1959, r'û. 111 – 130.

[15] Bi hûrbînî – di jêdera 1 da.

[16] □□□□□□□ □□□□□□□□□, □□□□□ □□□□□□□□□□□□, □□□□□□, 1991, □□ 123–131//*Movsês Xorênatsî*, "Dîroka Ermenîstanê", Yêrêvan, 1981, r'û. 123–131.

[17] Геродот, История, I, стр. 108//*Hêrodotos,* "Dîrok", I, r'û. 108.

[18] □□□□ □□□□□□□□□ □□□-□□□□□□□□□□□, «□□□□□□ □□□□□□□□□», □□□□□□□□, 1910, □□ 3 – 4 //*Sîon Arxîmandrît Têr-Manvêlyan*, "Kurmancên yêzîdî", Axaltsxa, 1910, r'û. 3 – 4.

Li vira, dema Têr-Manvêlyan dema di derbarê êzdîyan da diaxive, mabesta wî ne yekîneyeke êt'nîkî, ya ji kurdan cuda ye. Ji navê p'irtûkê: "Kurmanjên yêzîdî" jî diyar e, ku ji bo xudanê p'irtûkê nûnerên vê civaka êt'nîkî-bawerî kurmanc in. Lê kurmanc jî, wek ku tê zanîn, beşê gelê k'urd ê herî mezin e (zêdetirî 70%), yên ku bi zaravê kurmancî yê zimanê k'urdî diaxivin. Di vê p'irtûka xwe da S. V. Têr-Manvêlyan navê vê civaka êt' nîkî-bawerî bi 9 şêwazên cuda dinivîse û bi giştî 150 caran bi k'ar tîne: ***yêzdî*** – 44 caran (ev têrmîna bêtir nêzîkî xwenavkirina êzdîyan bi xwe ye – ***êzdî***), ***k'urd*** – 24 caran, ***kurmanc***– 17 caran, ***yêzîd*** – 8 caran, ***kurmancên yêzdî*** – 5 caran, ***yêzîdên kurmanc*** – 4 caran, ***yêzîdên medyayî*** – 1 carê, ***k'urdên yêzdî*** – 1 carê û ***kurmancên yêzîdî*** – 1 carê. Û, ji bilî vê, ew van hemû navan dem bi dem bi p'eyv û p'eyvebendên dinê, yên weke "peyhatîyên medên kevnar", "peyhatîyên Êkbatanê", "peyhatîyên medîyaîyan", "peyhatîyên vîşapazûnên medyayî", "şaxê Aşdahakê leheng ê medyaî" û yên dinê r'a bikartîne.. .

[19] https://hy.wikipedia.org/wiki/□□□□□□□_□□□ (Di derbarê Tîgranê Mezin da);

